1

# Mafê kê heye?


## Bê cûdahî hemû zarokên li Yûnan mafê wan heye xwe bigihîjin perwerdaya dibistanê.




Ji bo ku zarok li dibistanê werin tomarkirin-qeydkirin yek şertek heye werin aşî-derzîkirin, ew jî berpirsiyariya Wezareta Tenduristiyê ye.

Bernameya Wezaretê armanca wê gihîştina perwerdeyê ji bo zarokên ji 4 salî heta 15 salî ku temenên wan ji bo dibistana neçarî-mecbûrî Pêşdibistanê heta Dibistana Navendî ye. Ji bo ku hemû zarokên penaber li pergal-sîstema perwerdaya yûnanî werin bicîhkirin du tercîh-bijartin henin.

### ZAROKÊN KU LÎ MÊVANXANÊYÊN VEKÎRÎ ÊN DEMÎ DÎMÎNÎN



**Zarokên ji 4 salî heta 5 salî***


Mafê wan henin biçin pêşdibistanê-krêş û ev dibistan wê di nava mêvanxaneyên vekirî ên demî de werin avakirin.

**Zarokên ji 6 salî heta 15 salî***

Kordînatorên Perwerdeya Penaberan wê dê û bavên zarokan agahdar bikin 1. Wê zarok danê sibê biçin dibistanê an, 2. wê li dibistanên piştnîvro Avahiyên Peşwaziyê a Perwerdeya Penaberan werin tomarkirin, ev dibistanên dewletê nin û ji aliyê Wezaretê ve tên diyarkirin û saet di navbera 14:00-18:00 da wê kar bikin. Li wir wê bi zimanê Yûnanî wek zimanê dudiyan werin perwerdekirin û dersên zimanê îngilîzî, matematîk, werziş-spor, dersên çandî û kompîtûrê werin dayîn.

Rêxistina Navnetewî a ji bo Penaberan (IOM) ji mêvanxaneyên vekirî ên demî ji bo çûyin û hatina zarok a dibistanên ku hatinin hilbijartin bi otobûsê-basê bi refeqatên xwe IOM dabîn-mîsoger dike.

### ZAROKÊN KU LÎ NAVÊNDÊN BAJARAN DÎMÎNÎN:



**Zarokên ji 4 salî heta 5 salî**

Karin li pêşdibistanên dewletê werin tomarkirin-qeydkirin.

**Zarokên ji 6 salî heta 15 salî**

Zarokên ku li navendên bajaran dimînin pêwiste biçin dibistanên dever-herêma xwe li dibistana danê sibê xwe tomar-qeyd bikin. Dibistan vê gavê ji aliyê Wezaretê ve tên dîtin, ji bo ku dibistanên ku hatinin hilbijartin belavkirina zarokan li van dibistanan wekhev be. Dîsa Wezaret safên pêşwaziyê ji bo zarokên penaber û koçberan ji bo danê sibê bi kar tîne û li vir zimanê yûnanî wek zimanê duyemîn tê perwerdekirin.

**Zarokên 16 salî heta 18 salî****

Da ku perwerde ne mecbûriye, Wezaretê Pol-safên Peşwaziyê li dibistanên Amadeyî an jî Dibistanên Pişeyî ê Amadeyî (ΕΠΑΛ) ku zimanê yûnanî wek zimanê duyemîn tê perwerdekirin diyar kiriye.

* Li gorî pergal-sîstema perwerdaya dibistanên yûnan û li gorî biryara nuh a Wezaretê.
** Li gorî pergal-sîstema perwerdaya dibistanên yûnan û li gorî biryara nuh a Wezaretê.

CHILDREN 4-5 years old

CHILDREN 6-18 years old

2

# Kî plana bernameya analîtîk dike;

Wezareta Perwerdê, Lêkolîn û Olî bi temamî ji bo plan û bi karanîna bernameyên perwerdaya a fermî berpirsiyare.

Saziyên Rêxistina Netewên Yekgirtî, saziyên Navdewletiyên din, û Saziyên Sivîl bi destûra ku ji Wezareta Perwerdayê karin bêfermî bernameyên perwerdayê û dersên zimanê zikmakî bidin zarokan. Ji bo zarokên ku emrên wan di salên dibistana mecbûrî da ne ev bernameyên perwerdayê karin werin li darxistin, lê pêwiste roj û saeten van bernamena neyîn ser bernameya perwerdaya fermî.

3

# Pêvajoya tomarkirin-qeydkirinê kîjan e;

| JÎ BO ZAROKÊN KU LÎ MÊVANXANÊYÊN VEKÎRÎ ÊN DEMÎ DÎMÎNÎN | JÎ BO ZAROKÊN KU LÎ NAVÊNDÊN BAJARAN DÎMÎNÎN: |
|---|---|
| ΣΕΠ — Kordînatorên Perwerdayê Penaberan ê her navenda mêvanxaneyê wê malbatên zarokên ku diçin dibistanê agahdar bikin, dîsa wê ji bo çûyin û hatina zarokan ji navendên mêvanxan û dibistanê, bi hûrgulî agahî werin dayîn. | ΣΧΟΛΕΙΟ — Malbatên zarokan pêwiste zarokên xwe, li dibistanên ku li nêzîkî derdorê mala wan in tomar-qeyd bikin. |
| Kordînatorên Perwerdayê ê Penaberan ji bo çûyin û hatina zarokan bi otobûsê-basê ji aliyê Rêxistina Navnetewî a ji bo Penaberan (IOM) bi refaqatên hilbijartî tê kirin wê razîbûna malbatan bixwaze. | Belgeyên ku ji bo tomarkirinê tên xwastin Qerta Daxwaznameya Parastina Navnetewî a xwendevan,deftera aşîyan-derziyan û Deftera Şexsî a Tenduristiyê a Xwendevan û dîsa belgeyên ji welatê ku jê hatiye (eger hebin). |
| ΣΕΠ — Kordînatorên Perwerdayê Penaberan ji bo tomarkirin-qeydkirinê wê hemî belgeyên pêwist berhev bike (qerta îlticayê, deftera tenduristiyê, belgeyên dibistanên ji welatên ku jê hatine, razîbûna malbata ji bo çûyin û hatina zarokan û h.w.d.) ji bo hemî zarokan li navendên mêvanxana her kes berpirsiyare. | Bi gelemperî belgeya xanî-mal tê xwastin, weke navnîşana mal-xanî, eger ku ev kes li navenda mêvanxaneya ku bi rêxistinî dimîne, an jî kontrat/delîl a xanî/mala ku hatiye kirê kirin |
| ΣΧΟΛΕΙΟ — Kordînatorên Perwerdayê Penaberan ev belgeyên ku li jor kom kirine wê bide kesên ku li her diistanê ji bo tomarkirina zarokan berpirsiyare. | Di rewşa penaberan da, daxwazkerên îlticayê û kesên din ku ji warên xwe hatine derxistin belgeyên ku ji wan tên xwastin kêm bin jî wê werin qebûlkirin. Midûr-Gerînendeyên dibistanan vê taybetiya zarokan nasdikin û wê alîkarî û piştgiriya ku hewce bike wê bidin. |

## Li Yûnan çûyina zarokan a dibistanê, penaberan mecbûr nake ku li Yûnan bimînin.

Perwerdeya zarokên penaber heta dema ku li Yûnan dimînin çûyina wan a dibistanan mecbûriye û ji bo menfaata zarokana, herweha îstikrar û nîzamiyê dide wan. Û dîsa dema ku ji vir biçin wê belgeya ku li Yûnan ders şopandinin werbigrin

Dema ku belgeyên ku ji bo tomarkirinê tên xwastin kêm bin jî, Wezareta Perwerdeyê ji bo tomarkirina zarokên penaberan li dibistana alîkarî dike. Malbatên zarokan ku ji bo tomarkirinê belgeyên ku tên xwastin tinene, pêwiste dîsa jî zarokên ku binivisînin û Wezareta Perwerdeye piştgiriyê bide vê hewla wan.

Ji bo hemî zarokên penaberan li dibistanan werin bicîhkirin Pol-safên Peşwazîkirinê danê sibê hatine avakirin, malbat dikarin herin cem midûr-gerînendeyên dibistanan.

## 4 Zarok çi wext kanin dest bi perwerdahiyê bikin?

Dibistanên danê sibê dest pê kirine, di heman wextê da tomarkirinên ji bo Pol-safên Pêşwazikirê ên piştnîvro li navendên mêvanxanên vekirî ê demî dest pê dike.

Ji bo zêdetir agahiyan ji kerema xwe re bikevin vê malperê :
http://www.minedu.gov.gr/ekpaideusi/refug-educ
Û bi vê e-maîlê bikevin têkiliyê :
info-refugee-education@minedu.gov.gr

Karmendên ku li navendên mêvanxaneyên vekirî kar dikin, eger pirsên wan hebin an jî zêdetir piştgirî ji bo ku bi malbatên zarokên penaber re bikevin têkiliyê, karin bi Koma Yûnanî a Kar a ji bo Perwerdeyê re li ser vê lînkê bikevin têkiliyê: eswg.greece@gmail.com

Zor spas ji bo hevkariya we !

Kanûn-Berfanbar 2017

Bi piştgiriya Komîsyon Awrûpa yê & UNICEF

ΕΛΛΗΝΙΚΗ ΔΗΜΟΚΡΑΤΙΑ
Υπουργείο Παιδείας
Έρευνας και Θρησκευμάτων

Picture Credit: © UNICEF

# GİHÎŞTİNA PERWERDEYÊ

AGAHÎ Jİ BO KARMENDÊN MÊVANXANEAN
Û MALBATÊN PENABERAN

